Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :890 18-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Dijminên dinya û fezayê ne



Ji ber ku hikûmetên welatan û qanûnçêkerên wan serê xwe pê naêşînin, li ser dinyaya me û zindiyên wê tehlûkeyên pir mezin çêbûne. Avhewaya diguhere, ji bo gelek zindiyan êdî bûye sedem ku tine bibin. Heta mirov jiyana xwe bixwe jî bi birîna daristanan, bi dermankirina zêde ya zeviyan, bi zêdebikaranîna çavkaniyan û serfkirina zêde tîne ber keviya zinarekê: Eger dev jê neyê berdan wê di latê de wer bibe. Ango xemsarî dijmina dinyayê ye. Lê li derdora dinyaya me jî bê hesab çopa mirovan kom bûye. Li fezaya hema li derveyî me tingekî mezin yê çopa fezayî berhev bûye. Ji ber ku derd û kulên hikûmetên welatan jî sirf berjewendiyên demkurt yên çînên xwedî îmtiyaz e, ti tedbîran nagirin. Qanûnçêkerên wan jî ti qanûnan dernaxin. Li qada navneteweyî jî rewş ne çêtir e. Ango xemsarî dijmina fezayê ye jî.

**Belkî em di dinyaya xwe de heps bibin**

Bermayiyên roket, kêştiyên fezayê, satelîtên kevin û çopên din yên mirovan jî li dora dinyayê li ba dibin. Texmînî 228 milyon parçeyên wisa hene li dora dinayayê. Ew rabihuriyê bîr bixin jî, ji bo siberojê tehlûke ne. Tehlûkeya herî mezin jî wiha ye: Eger parçe li hev bikevin, hev du bipekînin û ew jî bi awayekî zincîrî li hin parçeyên din bikevin û parçe hemû êdî bipekin û li dora dinyayê bigerin. Zanyarê NASA Donald Kessler sala 1978an gotibû, eger ev biqewime, li dora dinyaya me wê tebeqeyek çêbe û ev tebeqe wê me li nava dinyayê hebis bike. Ango seferên ji dinyayê ber bi fezayê ve wê ne mûmkin bibin. Weke din ketina wan ya ser rûyê erdê jî her weke tehlûke dimîne. Ji bo pêşîgirtina li van tehlûkeyan, dewlet jî û Neteweyên Yekbûyî jî halê hazir xemsar in.

***Ozgûr Polîtîka***

# Li Çînê 2 cureyên dînazoran yên nû hatin dîtin



**Li bajarê Tûrpan-Hanî ya herêma Sîncar ya Çînê, 2 cureyên dînazoran yên nû hatin dîtin.**

Li gorî nûçeya kovara Scîence et avenîrê, ji bermayiyên 3 dînazorên li Çînê hatîn dîtin, tê diyarkirin ku ji van 2 cûreyên nû ne. Hat ragihandin ku ji dînazorên hatîn dîtin ji cinsê Soropodes in û ji cureyekî wisa ne ku ji 15 metreyan dirêjtir in. Li bajarê Hûrpan-Hamî yê herêma Sîncarê ya Çînê, gelek bermayiyên dînazoran hatin dîtin. Di nûçeyê de hat diyarkirin ku ser 20 salî re ye, li Çînê daxuyaniyên cureyên mîna van keşif hatine kirin. Agahiya ku cara yekê ye 2 cureyên nû yên dînazoran hatine dîtin jî par ve kir.

Di nûçeyê de tê gotin ku bermayî pir parçe ne, hestiyên sing û piştê yên dînazoran hatine dîtin.


Li gorî analîza ji Akademiya Zanistê ya Çînê Xîaolîn Wang ve hatî kirin, dînazorên mijara gotinê, xwe digihînin dîroka berî 130 heta 120 hezar salî. Ji bo tesbîtkirina vê jî lêkolînvan ji bermayiyên din yên dînazorên li welat hatîn dîtin sûdê digirin. Xebata lêkolînvanan jî di kovara Scîentîfîc Reports de hat weşandin. Dînazorên Soropodes xwediyên taybetmendiyên yek ji dînazorên heyîn yên herî mezin in. Dînazor 4 ton in, dirêjiya wan dibe ku ji avayiyeke 5 qatî dirêjtir be.

***ANF***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Î | D | | Ş | A | M | | A | X |
| 2 | Z | I | Q | Û | M | | L | | W |
| 3 | | K | A | | E | D | E | N | E |
| 4 | M | | H | Û | T | | M | Î | |
| 5 | A | R | Î | | A | D | | S | Ê |
| 6 | M | A | R | S | | Î | S | A | |
| 7 | I | | E | | A | L | Ê | N | C |
| 8 | K | Ê | | Î | N | | R | | Ê |
| 9 | | L | I | | F | I | T | A | R |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Kurtebêja Antîmonê... Temaşevan
2. Nasnavê ku berê didan fermandarê Kazakan... Notayek
3. Notayek... Nexweşiyek... Keriyê mî û bizinan
4. Peyva neyînî... Di zimanê zarokan de lêxistin
5. Cureyekî xwînê... Cihê heranê... Cihê ku çûk û teyr lê datînin
6. Lixwekirina piyan... Jimara du, çar, şeş, heş û hwd.
7. Sendîkaya Karkeran ya Swêdê... Cephe, bere
8. Armanc, hedef
9. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku weke sembola hêzê bi kar tînin... Xweliya piştî şewatê

**JOR-JÊR**

1. Agir... Kurtebêja Zîvê... Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?
2. Bajarekî Tirkiyê
3. Tevgera hewayê... Paytexta Îtalya
4. Pirç... Tîpên navî yên “saet”ê
5. Bayê rojhilat... Qumaşek ku ji hiriyê çêdibe
6. Rojek... Bi erebî “ez”
7. Pêxemberek
8. Bajarekî me... Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê
9. Sir, tiştê her kes pê nizane... Rengek

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ajanda (Fransaî) | Bername, rojev, plan, program |
| Bendav | Ciyê ku av lê tê sekinandin. Benda avê, sikir, sike |
| Destwerdan | 1. Tevlîbûna kesekî ya karekî, di aliyê erênî û neyînî de. Mûdaxele. Dest li karê me werdan. 2. Serrastkirina karekî. Dest lê werda, xwe tevlî kir |
| Gundewar | Gund û deverên derveyî bajaran |
| Jêder | Çavkanî, serkanî, ciyê ku tiştek jê tê. Çavkaniya vê nûçeyê ne saxlem e. |
| Jîngeh | 1. Ciyê mirov lê dijîn. 2. Derdor, xweza, tebîet |
| Kanal (Fransî) | 1. Co, ciyê kûr yê av tê re diçe. 2. Dezgeha televizyonê. 3. Rê, rêçik |
| Nexasim | Nemaze, bi taybetî. Dengbêjên berê pir xweş dikirin, nexasim Mihemed Arif |
| Rêje | Mezinayî, pirbûn-kêmbûn, di aliyê dereceyê de girêdana di navbera du tiştan, yan di navbera parçe û tevayiyekê de. Nisbet. Rêjeya xwendekarên serkeftî ji sedî 80 ye |
| Şênî | Kesên li tax, gund, bajarok, navçe û bajaran dijîn. Şêniyên gund dîlan girtbûn |

# Tûrikê Çîvanokan

*Di tûrikê me de îro sirûda li ser dolavê heye. Yek ji amûrên ristinê yên berê dalov bû. Piştî ku hirî li şeh didan û amade dikirin, bi dolavê diristin dikirin benik. Bi wan benikan jî pêdiviyên malê çêdikirin. Dolava her malê tinebû. Berê dema keçikek dizewicî ku rewşa malbava wê ya aborî baş bûya li rex cihazê wê dolavek jî dişandin. Çawa ku di wêne de jî tê dîtin dolav ji daran çêdibe û bi destiyê wê ba didin. Dengê wê jî pir xweş e guveguv jê tê.*

**DOLAV**

Guvguv guvguv dolavê
Destî darê benavê

Hirya berxa verêse
Guvguv guvguv dolavê

Avde avde birêse
Destî darê benavê

Darê dolavê nerm e
Guvguv guvguv dolavê

Dora dolavê germ e
Destî darê benavê

Pîrê destê wê çerm e
Guvguv guvguv dolavê


Bûka malê lê şerm e
Destî darê benavê



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 890 18-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Li Efrînê ji ber zordariya dagîrkeriya Tirkan jinekê xwe kuşt

Çavkaniyeke taybet ji Efrîna dagîrkirî ragihand ku li taxa Mehmûdiyê ya Efrînê ji ber zordariya artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê, jinekê xwe kuştiye.*R-2*



# `HEDEF DESTKEFTIYÊN GELÊ KURD IN`



Endamê Komîteya Rêveber ya PKK’ê Mûrat Karayilan: Rast e hedefa dewleta tirkî ya yekê PKK ye, lêbelê hedefa din destkeftiyên gelê Kurd in. Hesab û planên dewleta tirkî li ser başûrê Kurdistanê hene. Ti kes nikare derveyî vê heqîqetê, behsa niyeta Tirkiyê ya qirêj dest bike. Lewra ne ji bo PKK’ê tenê ji tevayiya gelê Kurd re dibêje teror. R-4

## Taştiya roja Înê ji kevneşopiyên welatiyên Sûriyê ye

Her hefte malbat li hêviya roja Înê ne ku li hev kom bibin û bi hev re taştê bixwin. Teybetiyeke taştiya Înê ew e ku sifre bi Fûl, Felafil û Himisê tê xemilandin. *R-7*



## Endamê DAIŞ’ê îşkence li zarok kir



Bûyereke tundûtûjî û îşkenceya hovane ya din jî li herêma Hejîn a bajarê Dêra Zorê- Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê çêbû. Jinek ji aliyê hevjînê xwe ve bi zarokê xwe re bi şîdetê re rûbirû ma. *R-3*

## `Dewlata tirkî ji qirkirin û talankirinê têr nabe`



Dewleta tirkî ya dagîrker bi tevayiya rêbazên xwe yên qirêj dixwaze gelê Kurd tine bike. Yek ji wan rêbazan tecrîda giran ya li ser Rêber Gelê Kurd Abdullah Ocalan ne. Îbrahîm Mehmûd diyar kir ku, armanc ji tecrîdê qutkirina şkandina vîna gelê Kurd e. *R-5*

## `Paqijî erkê her kesî ye`

Li bazara Hetîn ya bajarê Qamişlo, li ser qirêjiya li derdora konteynirên gelaş, walatî û endamên şaredariyê ji me re axivîn. *R-6*



# Li Efrînê ji ber zordariya dagîrkeriya Tirkan jinekê xwe kuşt

Çavkaniyeke taybet ji Efrîna dagîrkirî ragihand ku li taxa Mehmûdiyê ya Efrînê ji ber zordariya artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê, jinekê xwe kuştiye.



Çavkaniyeke taybet ya nêzî malbata jina xwe kuştî ku nexwest nasnameya xwe eşkere bike, diyar kir ku Ayşe Mihemed Xalid (20) êvara 13`ê Tebaxê xwe li mala xwe ya li bajarê Efrînê yê dagîrkirî, xwe darve kiriye. Çavkaniyê da xuyakirin ku Ayşe ji gundê Basûtê yê girêdayî navçeya Şêrawa ye, zewiciye û zarokekî wê heye û li taxa Mehmûdiyê ya li Efrînê bi cih bûbû.
Çavkaniyê herwiha da zanîn ku Ayşe ji ber zordariya artêşa Tirkan ya dagîker û çeteyên wê û tengavkirina welatiyan, xwe kuştiye.
*ANHA*

## Çeteyên Tirkiyê li Efrînê daran dibirin û malan difiroşin



**Li gorî agahiyên çavkaniyan ji kantona Efrîna dagîrkirî dayîn, çeteyan li derdora 280 darên zeytûn û gozan birîne û milkên welatiyên resen difroşin.**

Çavkaniyan diyar kir ku çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker 12'yê Tebaxê li gundên Çoqê û Stêr yên navenda bajarê Efrînê li derdora 130 darên zeytûnan yên welatiyan birîne.
Li gorî çavkaniyan, li gundê Coqê 90 darên zeytûnan yên Osman Hemo û li gundê Stêr 40 dar yên welatiyê bi navê Nûrî Mihemed hatine birîn.
Li navçeya Bilbilê jî di heman rojê de çeteyên "Lîwa Şemal" li derdora 90 darên zeytûnan û 10 darên gozan yên welatiyê bi navê Resûl Mihemed birîne.
Çavkaniyan herwiha da zanîn ku kesên li Cindirêsê jî bi cih bûyîn, li derdora 50 darên zeytûnan yên Ebdo Mûrad yê ji gundê Keferdelê birîne.
Li navenda bajarê Efrînê jî çeteyên "Ehrar El-Şerqiye" dest danîn ser avayiya Komeleya Buhar ya nêzî navenda çandê. Komele ya welatiyê bi navê Mihemed Mistefa Elî yê ji gundê Bablîtê ye.
Li aliyekî din jî çeteyên "Ehrar El-Şerqiye" xaniyê Cûma Mihemed yê li derdora çerxeriya Maratê bi 2 hezar dolarî firotine kesekî ji Helebê. Cûma Mihemed Kurdekî gundê Xelnêrê ye.
Li gorî çavkaniyan, kesek ji herêma Qelemon ya gundewarê Şamê ku li taxa Eşrefiyê ya navenda bajarê Efrînê bi cih bûye, xanî û dikana welatiyekî bi navê Ramî Îbrahîm yê ji gundê Dêr Sewan yê navçeya Şerayê firotine. Çavkaniyan diyar kir ku xanî bi hezar û 400 dolarî û dikan bi 800 dolarî firotine çeteyekî "Feyleq El-Şam" ku ji Idlibê ye.
*ANHA*

## Koalisyona Navneteweyî bi desteka QSD'ê serçeteyekî DAIŞ'ê girt

**Bi desteka Yekîneyên Antî-Teror yên QSD'ê, hêzên Koalisyona Navneteweyî serçeteyekî DAIŞ'ê girt.**

Li gorî agahiyên Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) belav kirîn, hêzên Koalisyona Navneteweyî li bajarokê Mihêmdiyê yê rojavayê Dêrazorê bi operasyonekê serçeteyekî DAIŞ'ê girtiye.
Navendê da zanîn ku çeteyê hatî girtin, teqîn û bûyerên kuştinê plan dikirin û şane bi rêxistin dikirin. Herwiha têkiliya di navbera şaneyên li nakur û rojhilatê Sûriyê û sînorê Iraqê-Sûriyê de, bi rêxistin dikirin.



Herwiha gelek madeyên teqemeniyê, çek û belge bi çete re hatin desteserkirin.
Navenda Ragihandinê piştrast kir ku Yekîneyên Antî-Terorê yên QSD'ê beşdarî operasyonê bûne û piştgiriya ewleyiyê daye hêzên koalisyonê.
*ANHA*

## Di 835 êrişên dagîrkeriya Tirkan de li dijî Minbicê 30 sivîl şehîd bûne

**Ji dema rizgarkirina bajarê Minbicê ve ji çeteyên DAIŞ`ê ya berî 5 salan, ji ber êrişên rojane yên artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê li dijî gundên Minbicê yên nêzî herêmên dagşrkirî, 30 sivîl şehîd bûne.**

Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê bîlançoya 5 salan ya êriş û topbarana artêşa Tirkan ya dagşrker û çeteyên wê li dijî gundên rojava û bakurê Minbicê, belav kir.
Bîlançoya êrişan hemwextî salvegera 5an ya rizgarkirina Minbicê tê weşandin. Welatiyên bajarê Minbicê salvegera rizgarkirina bajarê xwe ji çeteyên DAIŞ`ê di Tebaxa 2016`an de bi destê Meclisa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD), pîroz kirin.
Li gorî bîlançoyê, "Artêşa Tirkan ya dagîrker ji baregehên xwe yên li herêma "bêçek" ya li ser xeta Sacûrê û rojavayê Minbicê, 835 caran êriş pêk anîne.
Herwiha balafirên şer 4 êriş , balafirên keşfê jî 3 caran li eniya El-Erîme êriş pêk anîne û di encamê de sivîl birîndar bûne."
Li gorî agahiyên Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê dayîn, "Gundên sivîlan rojane rastî topbaranê tên. Bi vê yekê jiyana sivîlan, sewalan dikeve xeterê, mal tên roxandin û zirar digihe erdên çandiniyê. Li gorî raporê, 2900 topên ji her cureyê



çekan li herêmê ketine.
273 caran gundên sivîlan bi 115 topan bûne hedef. Ev rewş li gel bêdengiya navneteweyî dewam dike.
Herwiha 30 sivîlan û di nav de jin û zarok jiyana xwe ji dest daye û 67 kesên din birîndar bûne. Hinek ji wan astengdar bûne hinek jî bi pirsgirkên derûnî re rûbirû dimînin.
Herwiha li gorî raporê, dibistanek û mizgeftek li gundê Um Edesê yê bakurê Minbicê, hatine roxandin."
*ANHA*

## Li Efrîna dagîrkirî 3 sivîlên din hatin revandin

**Çavkaniyeke ji Efrîna dagîrkirî ragihand ku çeteyên bi navê "Polîsên leşkerî" bi hevkariya çeteyên Lîwa Mihemed El-Fatih, 3 sivîl ji navçeya Mabeta revandine.**

Çavkaniyê diyar kir ku di 10'ê Tebaxê de çeteyên bi navê "Polîsên leşkerî" û Lîwa Mihemed El-Fatih 3 welatî ji gundê Mamilo yê navçeya Mabeta revandine.
Li gorî çavkaniyê, kesên hatîn revandin ev in: Mihemed Xelîl (70), Elî Mihemed Şeban (42) û Ebdo Xelîl (50).
Çavkaniyê da zanîn ku çeteyan, Elî Mihemed Şeban û Ebdo Xelîl birine girtîgeha navendî ya li Maratê û




çarenûsa wan ne diyar e.
Li gorî çavkaniyê, malbata kalemêrê bi navê Mihemed Xelîl neçar maye ku hezar dolarî wek fidiya bide da ku Xelîl were berdan.
Li aliyekî din, sibeha Yekşemê li ser riya di navbera Ezaz û Efrînê de mayînek teqiya.
*ANHA*



# *Taştiya roja Înê ji kevneşopiyên welatiyên Sûriyê ye*

Her hefte malbat li hêviya roja Înê ne ku li hev kom bibin û bi hev re taştê bixwin. Teybetiyeke taştiya Înê ew e ku sifre bi Fûl, Felafil û Himisê tê xemilandin.

**Hediya HISÊN-Qamişlo**

Ji bo her malbata li Sûriyê taştiya roja Înê pir girîng e. Wê rojê malbat li hev kom dibe. Çimkî li gel her kesî roja betlanê ye. Li Qamişlo jî weke her bajarî ji serê sibehê zû malbat ji xewê radibin. Ji bo anîna himis, felafil, fûl û nanê qalind yek ji malbatê diçe firûn û xwaringehê. Yên li malê jî sifreya taştê amade dikin û li hev kom dibin. Hem taştiya xwe dixwin, hem suhbet dikin.
Derbarê mijarê de welatiya ji taxa Xerbî Rûla Emîn wiha axivî: "Taştiya roja Înê tamek wê ya xweş heye. Dayîka min fûl li malê amade dike. Her În divê fûl li ser sifreya taştê hebe. Digel ku roja Înê roja betlanê ye, em zû ji xew radibin da taştê bi hev re bixwin. Firavîn jî wê rojê xweş e û bi dilê me hemûyan ne. Ev kêliyên xweş di rojê din yên hefteyê nayên dîtin."

**Xwaringeha Qendîl beşek ji dîroka Qamişlo ye**

Hin malbat fûl, himis û felafil li malên xwe amade dikin û hin jî ji xwaringehê dikirin. Xwaringeha herî kevin li Qamişlo, ku fûl, himis û felafil tenê çêdike, Xwaringeha Qendîl ya li taxa Mûnîr Hebîb e. Xelkên Qamişlo bi giştî vê xwringehê nas dikin. Çimkî ev xwarigeh bi xwarinên xwe yên xweş binavûdeng e. Xweringehe



ji mirovan tijî dibe. Her yek taseke vala di dest de ye, li bendê dimîne ku fûl bi dest bikeve.
Xwediyê xwaringehê Mihemed Mehmûd li ser kar û xebata xwe ya li xwaringehê got, roja Înê li xwaringehê roja kar e, xawringeh ji xelkê vala nabe. Carna jê fûl û himis zû xilas dibin, nagihe her kesî.
Derbarê jimar û awayê amadekirinê de Miheme Mehmûd wiha got: "Roja Pênşamê em nîv bermîl fûl dixin nava avê, pişt re ji sibehan



heta êvaran dikelînin. Pişt re em pêdiviyên din yên weke teîn, mast, kemûn, xwê û zeyta zeytûnan amade dikin. Sîr û toza lîmonan jî kesê bixaze em jê re zêde dikin. Bi fûlê re xelkên me himis û felafilê dibin. Çimkî her kes ji van her sê xwarinan hes dike."
Ji bo xelkê Sûrî ev roj pîroz e. Malbat hemû kom dibin. Yên zewicîn jî li mala dapîr û bapîran kom dibin. Bi taştiya roja Înê tabloyeke bedew û tijî heskirin ya malbatê derdikeve.

## Xweşbûna kelandina genim

**Navenda nûçeyan**

**Her sal di heyva Îlonê de xelkên Rojava hazrkirina pêdevî û xwerekên zivistanê dikin. Yek ji wan xwerekan, kelandina genim e (Danûk). Bi kelandina genim hem parastina çanda xwe hem jî qûtê zivistanê hazir dikin.**

Dema jin û mêrên bi temen li taxê kom dibin û dûyê agir ji her alî ve bilind dikin û zarok jî li dora agir kom dibin, mirov dibêje qey cejne. Teqez di wê taxê de çêkirina danûkan heye. Heta kêliya dawî jî zarok li ber agirê genimê dimînin û danûkan dest dixin. Li gel xelkên Rojava liba genim heskirinek e. Ji dema dibe ştl heta dibe simbil tê çandin welatî genim weke zarokên xwe xwedî dikin. Genim pêdeviyeke sereke ye, lewra ard, nan, savar û gelek xwarinên din jê çê dibin.

**Çima di heyva Îlonê de tê kelandin?**

Kelandina genim ji kevinşopêyên gela ne û heta roja me ya îro dewam dike. Dapîr li ser axivîn ne û zarokan ji destê dayîkan xwarin e. Çawa ku mûsim xelas dibe û çewalê genim tê malê, piras yekê ya ku jin dike, liba genim hûre yan girs e? Dema ku dibêjin girse jin kêfxweş dibe. Çimkî genimê girs ji bo çêkirina savarê pir xweşe. Li gorî ku dapîr dibêjin; ji bo rengê genim zer were, di heyva Îlonê de tê kelandin.

**çêkirina danûkan**

Destpêkê genim ji kevir û pûş paqij dikin û dineqînin. Piştî paqijkirinê dişon û vala neqliyê (beroşa mezin ya danûkan). Piştî genim vala neqliyê dikin, neqlîî tijî av dikin heta ku bi ser genim dikeve. Keviran dixin bi neqliyê de û agir pê dixin. Ji du saetan heta sisiyan genim tê kelndin. Di van seatan de piçûk û mezin li hêviya çêkirina wê dimînin. Piştî tê kelandin ji nav avê derdixin û dixin satilan. Li ser pişta malê hesîlan radixin û genim lê belav dikin. Sê rojan genim li ser wan hesîlan belavkirî dimîne heta ku zuha dibe. Piştî zuha dibe ji bo paqijkirina wê ji qaşilan, li bêjinkê dixin. Kelandin genim ne bi tenê ji bo amadekirina savarê ye, ji bo kêfxweşiya zarokan ne jî. Berî ku genim li ser malê belav bikin, li zarokan belav dikin. Her zarokek tasek di dest wî/wê de ye



û para xwe ji genim dibe. Lê ji ber ku pir xweş e, zarok ne carekê, gelek caran tasikên xwe tijî dikin. Piştî genim zuhakirin û paqijkirina genim, jin û zilamê malê bi hev re dibin aş ta ku bikin savar û hurikê beloiyê û kutilkan. Piştî genim ji aş tînin jinên taxê kom dibin û genim li bêjinga hûr dixin da ku savar, dan, hûrikê beloiyê û kutilkan ji hev derbixin. Ya herî xweş di kelandina genim de ew e ku, zarok, dost û mirov li hev kom dibin û suhbet dikin, hin ji wan jî li derdora agir direqisin heta ku genim dikele.

## Li herêma Firatê Mihrîcana Şanoyê



**Desteya Çand û Hunerê ya herêma Firatê bi durişma "Arîn keziyên aştiyê ye" lidarxistina Mihrîcana Şanoyê ya yekê ragihand.**

Mihrîcan bi hevkariya Tevgera Mezopotamya ya çand û hunerê, wê di navbera 5`ê Cotmehê û 15`ê heman mehê de li ser dika Navenda Baqî Xido ya Çand û Hunerê ya bajarê Kobanê were lidarxistin. Ji bo bîranîna şehîd Arîn Mîrkan mihrîcan wê di dewreya xwe ya yekê de bi durişma "Arîn keziyên aştiyê ye" li dar bikeve. Wê gelek komên mûzîkê, şano û stiran ji kantonê û derveyî wê beşdar bibin. Mihrîcanê wê ji her kesî re vekirî be.
*ANHA*

## Efrîn, dilbera feqî

Em li ser vê xaka esmer, kevnar, li pey şûnpê çîrok û serhatiyên jinan ketin. Her ku me rastiya jinan dît, ilhama nivîsandina me mezintir bû. Hêvî bi ilhamê re ber bi çîrokên berxwedanê yên jinên hêviyê re diherike. Evîn û dîrok di singa axê de xwe kirin yekbeden.
Ez ê di vê nivîsa xwe de cih bidim serhatiya Nebiye Ehmed ku 36 sal in hunermed e û niha li Şehba koçber e. Nebiye Ehmed sala 1970'î li gundê Dilmiya yê navçeya Mabata ya Efrînê ji dayîk bûye. Dema Efrîn tê gotin, bedewî û delaliya darên zeytûnê tên bîra mirov. Mabata jî li gorî navçeyên din yên Efrînê, herî zêde bi zeytûnên xwe tê naskirin. Hunermenda kurd Nebiye Nebiye wiha qala çîroka xwe ya hunerê dike: "Li gundê me ji ber ku pergala axatiyê nebû, civak li gorî çanda xwe ya xwezayî dijiya. Mirovên gundê me mîna xwezaya xwe bûn. Min dema cîhana hunerê nas kir, cara yekê bi bilûrê nas kir. Bilûr amûreke mûzîkê ya bi hezarê salan e. Dengê wê li ser xeyalên min yê jiyanê gelek bandor kir. Di malbata min de bi temenê piçûk gelek mirî çêdibûn, xizim û kesên min bi rojan li ser miriyên xwe dilorandin û li bilûrê didan… Ev dengê bilûrê weke awazekê di hundirê dilê min de lêgerîna jiyaneke nû çêkir û ez li pey wî dengî ketim. Piştî ku ez pey van xeyalên xwe ketim, min xwe di awaz û dengê Eyşe Şana kurdî de dît û di newaya endama Koma Berxwedan, lehenga hunerê Hozan Mizgîn (Gurbet Aydin) de herikîm. Îca lêgerînên min ji bo huner û stiranan geştir bû. Cara yekê 1988'an ez tevlî Koma Çand û Hunerê ya Efrînê bûm. Piştî wê me navê koma xwe kir Koma Engîzek. Lê niha endama Kevana Zêrîn im û karê hunerê li wir dikim."

**Nebiye Ehmed**

Weke tê zanîn di civaka Kurd de berê şerm bû ku jin bistirînin. Gelek xizm û nasên Nebiye Ehmed, bi çavê şermê li karê wê dinêrin. Lê Nebiye di kar û xebata hunerê de gavên bi xwe bawer diavêje. Guh nade perdeya şermê û tevî astengiyan wû perdeyê diçirîne. Nebiye xwe digihîne cîhana hunerê û xeyalên xwe yên hunermediyê ji bo civak azad bibe pêk tîne. Ew niha li Şehba koçber e û 36 sal in xizmeta hunera azad dike. Dema ez pirsa berxwedana 58 rojan ya Efrînê jê dikim, çavên wê tijî rondik dibin. Bi dileke kul û keser wiha bersiv dide: "Me bi hêza hunerê û awazên hunerê 58 rojan li dijî 72 balfirên dagîrkeran li ber xwe da! Eger hêza gelê Efrînê ya çand û hunera xwe ya welatparêziyê nebûya, ne pêkan bû ku li hemberî 72 balafirên dagîrkeran li ber xwe bide. Ruhê hunera azad, em fêrî berxwedana rûmetê kirin. Hunera azad, li dijî her êrîşê dikare bibe dengê berxwedan û hêviya jiyaneke nû. Kêliyên berxwedanê gelek in. Me gelek ji wan kêliyan xistin stiran, em wan stiranan niha dixwazin bi berxwedana gelê xwe tacdar bikin û bi berxwedana Şehba re bixin bêndera hunerê."

**Cihê hêvî û azadiyê**



Erê şoreş; dikarin bi hunerê bi ser bikevin. Şoreşa rojavayê Kurdistanê şoreşa jin û hunera azad e. Huner, stiran, dengbêjî yek jî bingehê civaka jinan ya têkoşer e. Dema huner, stiran, helbest tên gotin; jinên afirîner tên bîra mirov. Îro jî li rojavayê Kurdistanê, şoreşa jinan û bi destê jinan hunereke azad tê afirandin û pêş dikeve. Nebiye Ehmed, jî kedkara vê şoreşê ye. Temenê wê 50 ye û dayîka sê zarokan e. Bi stiran û awazên xwe yên hunerê dibe hêviya çirûska berxwedana gelê xwe yê hatî koçberkirin. Bi gotinên stiraneke Nebiyayê, em vê çîroka xwe bi dawî dikin.

Efrîn, dilbera feqî
Bûka kurdî
Nan û danê Hûrî û Mîtanî,
Hunera Starê
Cihê hêvî û azadiyê

*XWEBÛN*

# `Paqijî erkê her kesî ye`



**Li bazara Hetîn ya bajarê Qamişlo, li ser qirêjiya li derdora konteynirên gelaş, walatî û endamên şaredariyê ji me re axivîn.**

**Mihemed XANIM-Qamişlo**

Dema mirov derbasî bazara Hetîn ya bajarê Qamişlo dibe, berî her tiştî qirêjî û bêhna li derdora konteynirên



FÎXAN HÎMO

gelaş, bala mirov dikşîne. Ji bo girtina agahiyên zêde li ser vê mijarê, me nerînên hin welatiyan girtin. Welatiyan di axaftinên xwe de hem bertekên xwe nîşan dan hem jî doza çareseriyê li şaredariya bajêr kirin.
Welatiyê bi navê Fixan Hîmo li ser mijarê wiha axivî: “Digel ku li kolan û bazaran konteynir gelaşê hatine danîn jî, lê her kes gelaşa xwe diavêje erdê.”
Di dewama axaftina xwe de Hîmo diyar kir ku, tişta ji welatiyan tê xwestin ew e ku, bi awayekî birêkûpêk gelaşê xwe bixin hundirê konteyniran û derdeora wan jî qirêj nekin da nebe sedema belavbûna nexweşiyan.
Fîxan Hîmo di dawiya axaftina xwe de ji şaredariyê xwest ku bi awayekî qanûnî li ser pirsgirikê raweste û sedemên kombûna gelaş diyar bike û got, `divê ji bo vê pirsgirêkê çareseriyek bê dîtin û li hemberî



SED ELHEWÎCE

paqijiyê her kes xwe berpirs bibîne û baldar be.`

### Paqijî nîşana pêşketinê ye



HEBÎB DERWÎŞ

Li ser heman mijarê sebzefiroşekî bazarê yê bi navê Saed Elhewîca da xuyakirin ku gelaşê li derdora konteyniran, bûye sedema nerazîbûna welatiyên ku tên bazarê û axaftina xwe wiha domand: “Em li vir kar dikin lê gemara derdorê û bêhna wê ya xerab dibe sedema dûrketina welatiyan ji vî cihî û rawestandina karê me.”
Di dawiya axaftina xwe de Elhewîca ji şaredariyê xwest ku vê mijarê çareser bikirin.
Welatiyê bi navê Hebîb Derwîş jî nêrîna xwe wiha anî ziman: “Eger gelaş demeke dirêj bimîne wê bibe sedema belavbûna nexweşiyan û wê her kes zirarê jê bibîne. Ji ber wê divê welatî û şaredarî bi hev re alîkar bin.”

### Paqijî û Ekolojî

Ji bo girtina agahiyên berfirehtir li ser vê mijarê, me serdana şaredariya bajarê Qamişlo kir û li gel hin berpirsên wê axivîn.
Rêveberê beşa paqijiyê Mehmûd Bekir li ser mijarê ev agahî dan me: “Li bazara Hetîn rojane du caran gelaş tê avêtin. Ji bo paqijkirina nava bazarê jî sê karker hatine erkdarkirin. Lê kesên li wir kar dikin û sebzeyan difiroşin derdora xwe pir qirêj dikin û bi karkerên paqijîyê re nabin alîkar.”
Bekir axaftina xwe wiha domand: “Di demên pêş de emê şiyariyê bidin welatiyan. Kesê gelaşê xwe li erdê bihêle wê were cezakirin. Herwiha wê tabloyên şiyarkirinê li bazarê werin daleqandin û ji bo naskirina kesên gelaş diavêjin derdorê wê kamîreyên çavdêriyê werin bicihkirin.”
Mehmûd Bekir di dawiya axiftina xwe de bang li firoşkarên bazarê û welatiyan kir ku bi şaredariyê re alîkar bin û wiha got: “Divê welatî bi me re bibin alîkar, lewra qirêjiyê zerarê digihîne tenduristiya mirovan.”
Rêveberiya beşa ekolojiyê Inad Elî jî, li ser heman mijarê wiha axivî: “Mijara bazara Hetîn mijareke girîng e. Lewra bazar di nava taxê de ye û qirêjiya wê dibe sedema ziyanan. Despêkê berpirsên vê pirsgirikê firoşkar in û ev qirêjî dibe sedem ku karê wan bixwe jî kêm bibe. Herwiha xweşikbûna derdorê jî têk diçe.”
Inad Elî axaftina xwe wiha qedand: “Em bi hêvî ne ku li ser mijara paqijiyê her kes xwe berpirsyar bibîne. Herwiha ji bo karkerên paqijiyê bikarin bi hêsanî gelaş kom bikin, divê her kes gelaşê xwe kom bike û bixe kîsan.”

## Dîwarên dikana xwe bi wêneyên bikiran (mişterî) xemilandine

Welatiyê bi navê Mihemed Mehmud li navçeya Derbendîxanê dikana xwe ya piçûk ya şiranî û vexwarinên sar, bi wêneyên kesên ji dikana wî tişt kirîne yan yan derbasî hundirê dikanê bûne, xemilandiye. Mihemed ev 15 sal in her kesê ku serdana dikana wî kiribe, wêneyê wî girtiye û bi dîwarê dikana xwe ve daleqandiye. Dikana xwe kiriye albûma mişteriyên xwe.
Li ser riya giştî ya navçeya Derbendîxanê dikanek piçûk ya vexwarinên sar û şiraniyê heye. Ev dikan ya welatiyê bi navê Mihemed Mehmûd (48) e, ku bi Hemey Sardemenî tê naskirin.
Mihemed di sala 1980’yan de li gel bavê xwe çayxaneyekê vedikin. Piştre di sala 1991ê de bi vekirina çayxaneyekê careke din dest bi karê dikandariyê dike. Piştî demekê li gel birayê xwe dikana firotina dorgerê (doner) vedike. Di sala 2005’an de jî dikana xwe vediguherîne dikana vexwarinên sar û şirînayiyê.
Mihemed û birayê xwe destpêkê wêneyên xwe li gel kesayetên naskirî yê serdana dikana wan dikin, digirin û bi dîwarên dikanê ve dadileqînin. Piştre li ser xwesteka bikiran (mişterî), wêneyên wan jî jî digirin û bi dîwarên dikana xwe ve dadileqînin.
Derbarê vî karî de xwediyê dikanê Mihemed Mehmûd ji Rojnews re diaxive û wiha dibêje: “Armanca me ya hilawistina wêneyan, ew bû ku wek bîranînekê ji bo kesên ku hatine dikana me bimîne. Hinek ji wan kesên ku niha wêneyên wan hilawistî ne, ne li Kurdistanê ne, hinekan jî wefat kiriye.”
Mihmed Mehmûd bi qasî 5 hezar wêneyên ji bajarok û navçeyên cuda yên başûrê Kurdistanê bi zikê xanî û dîwarên dikana xwe ve hilawêstine.
Mihemed Mehmûd dide zanîn ku wê





piştî xwe jî vî karî radestî zarokên xwe bike, da wek bîranînekê ev wêne di dikana wan de bimînin.
Di nava wêneyan de wêneyên pêşeng û serokên Kurd yên wek, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Celal Telebanî, Newşîrwan Mistefa, Berhem Salih û gelek kesayetên din yên naskirî hene.
Birayê Mihemed, Dilşad Mehmûd ku li gel birayê xwe şirîkê dikanê ye, wiha dibêje “Welatî ji ber vî karê me destxweşiyê li me dikin. Em hê jî wêneyên nû dadileqînin û dixwazin wek bîranîneke ciwan ya vî bajarî bimîne.”
Dikandarê bi navê Ferîdûn Çaycî ku dikana wî li kêleka dikana her du birayan e, wiha dibêje: “Hilawêstina van wêneyan karekî gelek baş e. Hinek ji van wêneyan yên kesayetên Derbendîxan û deverên din in. Cihê destxweşiyê ye ku ev wêne wek bîranîneke xweşik tên parasti.”

***ROJNEWS***


## Karkerên jin yên li ser erd: Qezenca me têra mesrefa me nake

Karkerên jin yên li ser erd dixebitin dan zanîn ku tevî zehmetiyan dîsa jî ji bo debara xwe bikin dixebitin, têkoşîna jiyanê didin û wiha gotin: “Em ewqas kedê didin lêbelê em rojê encax 70-80 TL’yî dikarin bibin malê. Qezenca me têra mesrefa me nake. Ev jî çîroka me ye.”

Jinên bê temînat û bi zehmetiyên mezin li ser erdan dixebitin dan zanîn têkoşîna jiyanê didin û wiha gotin: “Em dixwazin êdî derfet ji me re werin afirandin. Em dixwazin bi taybetî pêşî li jinan bê vekirin.”

### ‘Em li vir jî têkoşîna jiyanê didin’

Sîdra Huseyîn (18) ya ku bi eslê xwe ji Rojavayê Kurdistanê ye ji bo debara xwe çi kar hebe dike. Bav û diya Sîdrayê nexweş in û birayekî wê yê astengdar heye. Ji bo li wan binêre ew û xwişka xwe ya 16 salî tên karê çinîna xiyaran. Ji ber aboriyê û şertên dijwar her du xwişkan jî dibistan terikandine. Sîdrayê wiha dest bi çîroka xwe ya jiyanê kir: “Min ji berê ve terka dibistanê kiriye û xwişka min ya piçûk jî bi wî rengî.



Rewşa Tirkiyê ya aborî jî ne baş e. Em ji Rojava ji ber şer reviyan lê em li vir jî têkoşîna jiyanê didin. Em di nava rezaletê de ne. Min jî dixwest bibim xwenda û xwedî pîşe. Lê me ev jiyan weke qederekê erê kir û himbêz kir.”

### ‘Xeyalên min ne ev bûn’

Sîdrayê da zanîn di vî temenî de ketine xema kîrê û zemên tên û wiha pê de çû: “Em li gorî we zarok in, lê belê xem û mereqa ez hildigirim gelek e. Ez niha dikevim wê xemê ka ezê bikarim vê mehê diravên ceyranê, avê û kiriya malê derxim. Eger şert û merc ne wisa bûna minê jî xwendiba. Min jî ji dibistanê hes dikir. Xeyalên min ne ev bûn. Xeyalên min jî hebûn. Lê niha ya girîng ji me re xwedîkirina malbatê ye. Em dixwazin malbatê xwedî bikin.”

### ‘Hûn jî dizanin xizanî çi ye?’

Edla Çokan (42) jî dayika 5 zarokan e. Ew di kirê de rûdine û bi hevalê xwe hewl dide debara xwe bike. Edlayê diyar kir ku xwarinên xweş ji wan re lukseke mezin e û wiha berdewam kir: “Ev karker hemû xizan in. Eger ne wisa bûya kes ji wan nedihat ji sibehê heta êvarê di nava erdan de nedixebitî. Herwiha ne ewqas hêsan e di çaxeke wiha de mirov xwediyê ewqas zarok be. Şert û merc hatine guhertin. Niha em nikarin xwarineke xweş jî bidin wan. Ev ji bo wan lûks e. Gelo dema mirov nikaribe zarokên xwe têr bike hesteke çawa ye hûn jî dizanin? Hûn jî dizanin xizanî çi ye?”

### ‘Qezenca me têra mesrefa me nake’

Şukran Îlvaç (30) bal kişand ser zehmetiyên jin dibînin û wiha got: “Di karên li ser erd de bêhtir jin dixebitin. Mafê jinê tê binpêkirin û di nava civakê de wekî zayenda duduyan tê dîtin. Ji ber vê yekê ji her alî ve astengî li ser jinê heye. Civak wê teng dike, dewlet wê teng dike. Hişmendiya mêr li vir hê serdest e. Me nexwend. Me nikaribû di karekî bi dilê xwe de bixebitin. Niha jî ji bo em malbatê xwedî bikin em ji serê sibehê heta êvarê li ser erdan in. Bi giranî xebatkar jî xwendevan ên nehatine tayînkirin an jî dayikên mexdûr in. Em ewqas kedê didin lêbelê em rojê encax 70-80 TL’yî dikarin bibin malê. Ew jî têa mesrefa malê nake. Ev jî çîroka me ye.”

### ‘Ne pêkan e em dabara malbatê bikin’

Fatma. Al (17) jî yek ji wan xebatkarên zarok e ku ji bo ji malbatê re bibe alîkar dibistan terikandiye. Fatma û birayekî xwe tenê dixebitin. Ew wiha qala xwe û karê xwe dike: “Ez neçar bûm dev ji dibistanê berdim. Destên min û yên birayê min tenê kar digire. Nexweşên me hene û malbata me jî malbateke xizan e. Me barê debara malbatê da ser milê xwe û çi kar hebe em dikin. Em tenê di karên wisa de dikarin ji xwe re cih bibînin. Heta êvarê em dixebitin jî ne pêkan e em dabara malbatê bikin. Xwendin ji bo zarokekî girîng e lê belê malbat jî girîng e.”

### ‘Em nikarin meha xwe jî biqedînin’

Gulê Al (41) jî da zanîn ew nikarin dawiyê li meha xwe bînin û wiha got: “Em sala xwe bi karkeriya erd re diborînin. Eger ev kar nebe em nikarin meha xwe jî biqedînin. Bi taybetî jî xebatkar jin in. Me nexwend û nehiştin em bixebitin. Niha jî em li ser van erdan di nava şert û mercên zehmet de dixebitin û em diravekî hindik distînin. Mixabin rewşa me jî ev e. Mafên me nînin. Em jî li ber xwe didin ku li ser piyan bimînin.”

### ‘Em dixwazin jin pêş bikevin’

Maqbûle Al (34) jî bi lêv kir ku temînata jiyana wan nîne û wiha got: “Ne temînata jiyana me heye, ne jî diravekî me yê baş. Ne xaniyekî me heye ne jî em dikarin xwarineke xweş bixwin. Em weke koçberan in, ji vî karî diçin karê din. Ji bo em zarokên xwe bi tendirustî mezin bikin em hewidaneke mezin didin. Niha jî zêdetir xebatkarên vir ji bo wê yekê kar dikin. Em dixwazin ku êdî derfet ji me re werin afirandin. Em dixwazin bi taybetî pêşî li jinan bê vekirin. Em dixwazin jin pêş bikevin.”

***JINNEWS***



# Endamê DAIŞ’ê îşkence li zarok kir

**Bûyereke tundûtûjî û îşkenceya hovane ya din jî li herêma Hejîn a bajarê Dêra Zorê- Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê çêbû. Jinek ji aliyê hevjînê xwe ve bi zarokê xwe re bi şîdetê re rûbirû ma.**

Li herêma Hejîn a bajarê Dêra Zorê- Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê mêrek îşkence li hevjîn û zarokê wê kir. Zarokê 3 salî Yusif ji aliyê hevjînê dayika xwe ve rastî îşkence û lêdanê hat, hevjînê dayika wî bi amûrên tûj neynûkên Yossef rakirin û nehişt ku dayika wî nêzî wî bibe yan jî wî biparêze û heqaret li dayikê kir.

Fatima Hisên El-Dexîl a 30 salî, ji ajansa me re got ku ew niştecihê bajarokê Baxozê ye û qebûl kir ku bi kesê bi navê Abde Ilah Awad El-Şihab re bizewice ji ber ku wî berpirsyariya mezinkirin û piştgirîdayîna kurê wê Yossef girtibû ser milnê xwe.

### Nizanibû ku ew kes berê çeteyê DAIŞ’ê bûye

Fatima El-Dexîl nizanibû ku kesê wê pê re bizewice yê bi navê Abde Ilah awad El-Şihab, berê endamê DAIŞ’ê bûye. Li ser bûyerê wiha axivî: “Hêzên DAIŞ’ê hevjînê min kuştin, ez li cem zarokê xwe mam. Ji ber vê yekê min qebûl kir ez pêre bizewicim. Min nedizanî ku beriya niha endamê DAIŞ’ê bû û ji ber ku wî digot ew ê bibe wekî bav ji bo kurê min Yosef min bawerî pê anî. Piştre min ferq kir ku ew madeyên hişbir bi kar tîne, her dem aciz e û ji nişka ve diqîre û dest bi lêdanê dike.”

Li gel hevjînê Fatima El-Dexîl



taybetmendiyên sadîst hene, fatima dibêje ku hevjînê wê ji îşkencekirina zarok hez dike, ji ber vê yekê wî dermanê xewê dida wê û wiha gotinên xwe didomîne: “Hevjînê min bi zorê hin cureyên derman didan min û digot ku dermanê êşa piştê ye. Lê ez di xewre diçûm û di wê demê de wî kurê min îşkence dikir, her wiha dermanê ku wî dida min bandorek neyînî li ser min dikir, ji ber vê min veşart û nema xwar. Lê min ji wî re digot ez dixwim.”

### “Îşkenceyên hovane li zarokê min kir”

Fatima El-Dexîl neçar ma ku zarokê xwe xwedî bike û wiha dibêje: “Hevjînê min ji min re digot tiştekî bi pereyê min ji kurê xwe re nekire. Min pir sebir kir ji ber tirsê, lê hovîtiya wî roj bi roj zêde dibû. Wî lingên min bi zincîran girê dida û li pêş çavên min li kurê min dida. Neynûkê wî radikirin û cihên wî yên genîtal bi çixaran dişewitand û bi amûrên hesin li canê wî dixist, canî wî dişewitand, paç dixist devê wî ji bo ku dengê girîna wî nebihîze.”

Her wiha fatima li gotinê xwe zêdekir û got: “Hevjînê min endamekî çeteyên DAIŞ’ê bû û wî nedikarî rojek bê nedîtina xwînê bijî. Ji ber êşa ku kurê min dîtiye ez pir êşiyam.”

Fatima Hisên El-Dexîl gotinên xwe wiha domandin: “Dema ku wî ji bîr kir deriyê malê li me kilît bike, min kurê xwe hilgirt û ez ji malê reviyam û çûm mala malbata xwe.”

Di axaftina xwe de, ji saziyên pêwendîdar xwest ku mafê wê biparêzin û got: “Ez daxwaz dikim ku cezayê herî giran li vî sûcdarê ku dilovanî û mirovahiya wî nîn e bê birîn.”

### Komîteya Jinan rewşê dişopîne

Ji Komîteya Jinên Zenobiyar ya Hecînê Fatima EL-Salim ji ajansa me re wiha got; “Gelek herêman sûcê ku li dijî zarokê bi navê Yûsiv û diya wî fatima El-Dexîl qewimîne bihîstine û wiha domand: “Wekî meclisa jinan dema ku me doz bihîst me dest bi şopandina doza zarok û diya wî kir, me wan bir meclisê û rewşa ku pê re rû bi rû mane pirsî û em bi tedbîr tevdigerin. Em ê bixebitin da ku mafên wan bistînin û piştgiriya wan bikin, em ê her wiha bixebitin ku civakê perwerde bikin, bi xurtkirina ders û sempozyûmên hişyarkirinê ji bo têkoşîna li dijî tundiya li ser jin û zarokan.”

Fatima EL-Salim bang li rêxistinên navneteweyî, mafên zarokan û rêxistinên jinan kir ku alîkariya wan bikin da ku bi vê kampanyayê şîdeta li ser jin û zarokan ji holê rakin û li Fatima El-Dexîl û kurê wê Yûsiv xwedî derbikevin.

Hat zanîn ku piştî giliya Fatima El-Dexîl, Hêzên Ewlekariya Hundirîn kesê bi navê Abdullah El-Şîhab girtine. Li gorî qanûnên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, piştî ku tedbîrên pêwîst li dijî wî stendin, ew ê 15 salan di zindanê de bimîne.

***JÎNHA***

## Tevî temenê mezin neçare bixebite

**Fatma Yildiz ku ji bo debara xwe bike dezgah vekir û berhemên keda destê xwe difroşe, diyar dike ku ji ber temenê mezin zehmetiyan dikişîne û got qezenc têrê nake lê neçarim bixebitim.**

Li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê ji ber polîtîkayên desthilatdariyê krîza aborî giran bû û welatî êdî nikarin hewcedariyên xwe yên sereke jî pêk bînin. Ji ber krîzê bi dehan kargeh û dezgeh hatin girtin, hinek karsazan jî dawî li karê gelek kesî anî. Li aliyê din jî keda jinên ku fatura krîzê li wan hatiye birîn, nayê dîtin. Jina bi navê Fatma Yildiz ya 75 salî ku li Amedê sê sal in ji bo debara xwe bike berhemên xwe li ser dezgaha ku vekiriye difiroşe, yek ji jinên ku keda wê nayê dîtinê ye. Tevî temenê pêşketî, zehmet be jî neçare bixebite.



### ‘Qezenca min nîne’

Fatmayê derbarê mijarê de axivî û da zanîn ku bi qezenca ku ji vir digire nikare debara xwe bike û wiha pê de çû: “Rewşa aborî ya min ne baş e. Kesekî min nîne. Ez neçar im bixebitim. Ez alavên ku mirovan çêkirine tînim difiroşim. Ez rojane 20-25 TL qezenc dikim. Carna qet tiştek nayê firotin. Ji ber ku berhem ne yên minin, qezenc jî hemû ne ya min e. Ez ji serê sibehê ve li vir im qet qezenca min nîne.”

### ‘Destûrê nadin em li her derê bifiroşin’

Fatmayê da xuyakirin ku ew tenê dijî û ji ti kesî alîkariyê naxwaze û axaftina xwe wiha domand: “Nahêlin em li her derê firotinê bikin. Zabite dibêjin qedexe ye û me radikin. Em li ber derê malên mirovan dezgahê vedikin. Ez sibehê 09.00’an de dest pê dikim û 17.00’an de diçim malê. Ji ber pandemiyê karê me ne baş e. Sê sal berê me rojane 100 TL qezenc dikr lê niha em nikarin tiştekê qezenc bikin.”

***JINNEWS***



### Nijadperestiya tirkş ji olperestiya DAIŞ’ê jî bixetertir e

Gulîstan Xalid

Em dizanin ku bi Peymana Lozanê ya 24ê Tîrmeha 1923yan re Kurdistan bû çar parçe û her parçe ket binê dagîrkeriya dewleteke Rojhilata Navî. Ev dewlet jî kareketerên wan her çendî hinekê ji hev cuda bin jî, sîstemên wan xwe li ser bingehê yek neteweyê saz kirine. Ya din vê peymanê her çiqas erdîngariya Kurdistanê yekser parçe kiribe jî, bandoreke neyînî li tevayiya gelên Rojhilata Navî jî kiriye. Lewra li ti welatî gelek bi serê xwe najî. Li kîjan welatî desthilatdara nijadî ya kê be, ew bingeh e. Dema dewlet li gorî vê siyasetê tên sazkirin dibin sedema krîzên civakî. Ji ber ku ev siyaset dijberiya nava gelan jî pêş dixe, di hin kesan yan beşan de jî dibe hişmendiya nijadperestiyê.
Nijadperestî gotineke ku sedsala 20’an bi jenosîda Cihûyan ya ji aliyê Naziyan ve hatî kirin ketiye rojeva mirovayiyê. Çenda ev di kesayeta Hîtler û Naziyan de hatiye naskirin, di roja me ya îro de Hîtlerên kambaxtir û Naziyên bixetertir derdikevin.
Ti nijadperestî mîna nijadperestiya tirkî bixetertir nîne. Di nijadperestiya tirkî tê de her cureyê perestiyê heye. Hem zayendperestî, hem miletperstî. Ferastetanijadperestiya Tirkan di sloganeke wan de pir eşkere dibe; “Xwesî bi wî kesê dibêje ez Tirk im.” Ango li gorî vê ferasetê di siyaseta rojane ya di hundirê dewleta tirkî de jî mirov dibîne ku nêzîkatiyên ji gelên din re pêş dikevin li gorî vê hişmendiyê ne. Ango yê ne Tirk be bêşans e, yê ne Tirk be bêqîmet e û her nêzîkatiyeke ku wan bênirx bike, heta kuştinê jî heq dike. Yê ne Tirk be çi mezin çi piçûk bi gefa nijadperestiya tirkî re rûbirû ye. Yan heqaret, yan lêdan yan jî tehdîd û kuştin e. Vêca dema ku ev Kurd bin ya ku destpêkê tê bîra wan kuştin e. Li gorî nijadperestiya tirkî kuştina Kurdan rewa ye.
DAIŞ; çawa ku ji çeteyên xwe re kuştina kesên ne misilman ku jê re dibêjin kafir weke riya çûna cenetê didine nîşandan, nijadperestên Tirk jî ji bo çeteyên xwe kuştina Kurdan weke riya xelasiya Tirkan didin nîşandan. Weke amûrê parastina dewletê û sîstema ku xwe li ser esasê tinebûna Kurdan saz kiriye didin nîşandan. Hişê mirovan bi vê ferasetê didin şûştin û bi wan didin bawerkirin. Ji ber wê îro ti cudayî di navbera DAIŞê û nijadperestiya Tirkan de nîne. Heta nijadperestiya Tirkan ji olperestiya DAIŞê bixetertir e. Komkujiyên li bakurê kurdistanê li hemberî kurdan û herî dawî ya malbata li Konyayê, di aliyê feraset û rêbaz de jî careke din rastiya nijadperestiya tirkî û xetera wê radixe ber çavan.

# ‘Ruhê fedayî yê 15’ê Tebaxê îro xurtir û serwer bûye’

Karayilan: Ruhê fedayî yê 15’ê Tebaxê îro xurtir bûye, serwer bûye. Li gel vî ruhî, di taktîk û di teknîkê de ew qasi hakîmiyeta me çêbûye, ku refek gerîla karibe bi sedan, bi hezar leşkeran têk bibe.


**Navenda nûçeyan**



Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Mûrat Karayilan bi wesîleya salvegera 37’an a Pêngava 15’ê Tebaxê ji ajansa ANF’ê re axivî û di nirxandinên xwe de bal kişand li ser binkeftina artêşa tirk û kiryarên PDK’ê yên bi dewleta Tirkiyê re.
Karayilan li ser van xalan nirxand;

### Bi piştgiriya NATO’yê jî nikare li hemberî gerîla bi pêşve biçe

Niha em di salvegear 37’emîn a 15’ê Tebaxê de ne, ketine sala 38’an. Di vê der heqê de bi astekê pêşwazî dikin. Em di vê mijarê de bextewar in ku bi berxwedana Garê bi serketina Garê, bi berxwedana Avaşîn, Zap û Metîna salvegera 37’emîn a Pêngava 15’ê Tebaxê pêşwazî dikin. Ruhê fedayî yê 15’ê Tebaxê îro xurtir bûye, serwer bûye. Li gel vî ruhî, vî şêwazî em di taktîkê de weke dewlemendî û di teknîkê de hakîmiyet ku refek gerîla karibe bi sedan leşker, bi hezaran leşkerî têk bibe. Ev bingeha fikir û ramanê Apogeyî ye. Hîmê me, bingeha îdeolojîk, bawermendî heye. Tecrûbeya me ya taktîk û teknîk jî çêbûye. Ji bo wê em dibêjin êdî gerîla di sala 38’emîn de wê hîn bêhtir karibe rol bilîze û bibe bersiv.
Ev 112 roj in dijmin hîn jî nikare Avaşînê bigire. Ev ne tiştekî ji rêzê ye, li hemberî ewqas teknolojiyê, li hemberî ewqas derfetên NATO’yê ku ji bo dewleta Tirkiyeyê pêşkêş dike. Tevî vê jî artêşa Tirkiyeyê niha li wê



derê xitimiye û têk çûye. Bi esasî niha rewşa dewleta Tirkiyeyê li Avaşînê, Metîna û Zapê ji yê Garê xerabtire.

### Li Garê berçav bû, bi xwe jî îtiraf kir ku têk çûn, lê belê li vê derê hîn îtiraf nekirine, wê vê jî îtiraf bikin.

Em vê serketinê weke serketina tevahiya gelê Kurd dibînin. Ev ewladên gelê Kurd yên ji her çar parçeyên Kurdistanê ne. Heta heval û dostên enterasyonal, yên Ereb di nav de hene. Yanî ev berhemeke mirov e di şexsê gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê de îro li çiyayên Kurdistanê bilind dibe. Ev encameke ne tenê ji bo me, ji bo xelkên bindest ên li hember desthilatdarî û hegemonîzmê dixwazin tevbigerin, li ber xwe bidin ji bo wan hemûyan nimûneyeke mezin e, ku îradeya mirov dikare bersivê bide teknolojiya serdemê û têk bibe.

### Ne tinê PKK’ê re hemû Kurdan re dibêje teror.

Tifaqa navbera AKP-MHP-Ergenekon û Vatan Partîsî, konsepta li ser bûye yek çi ye? Mesele tenê ne PKK ye. Hemû destketiyên Kurd e. Yanî siyaseteke dijîtiya Kurd tê esasgirtin û di vê perspektîfa siyasetê de Kurdê azad û statuya Kurd ji bo wan xeter e.
Rast e hedefa yekem PKK ye, lê belê hedefa dîtir a duyem destketiyên gelê Kurd e. Hesabê xwe li ser Başûrê Kurdistanê heye. Kes nikare ji derveyî vê heqîqetê, niyeta Tirkiyeyê ya qirêj dest bigire. Ne tinê PKK’ê re hemû Kurdan re dibêje teror. PKK 40 sal in li vir e, 3 hezar şehîdên xwe yên ji Başûr heye. Ewqasî dem li vê derê ye. Li gorî hiqûqa Ewropayê ku 5 salan li welatekî Ewropayê bimîne, mafê xwe heye ku bibe hemwelatî. Yanî heta niha em qet nebûne hemwelatî? Ev çawa dibe? Qey cihê xwe yê neteweyî jî tune ye? Me Kurdistan nekiriye çar parçe. Ez bawerim hemû siyasetmedarên Başûrê Kurdistanê, xelkê me yê Başûrê Kurdistanê van dibîne.

### Yê ku têkoşîna çekdarî li me ferz dike, dewleta Tirk e


Gelê me baş dizane ku em weke PKK di bin barekî giran de ne, di şer de ne. Serokê me dîlgirtî ye, li ser zilm heye, êşkence heye; deh hezar mirovên me, kadroyên me, dilxwazên me li zindanan di bin zilmê de ne, li zindanan niha grev heye, li her derê li kolanên Tirkiyeyê li Kurdistanê li ser gelê me zilm heye, mirovên me li kolanan tên kuştin. Em li hemberî vê zilmê li ber xwe didin.
Heta dewleta Tirk nasnameya Kurdê nav xwe qebûl neke, ti carî Kurdê derveyî sînorê Tirkiyeyê re dostaniyê nake. Dostaniya xwe tev taktîkî ne, ji bo bikaranînê ye. Em îro bi kêfî vî şerî nakin. Li ser me, li ser gelê me êriş hatiye, li ser Başûrê Kurdistanê polîtîkayeke dijmin heye em li hemberî vê bêdeng namînin, em li hemberî vê li ber xwe didin. Ev berxwedan berxwedaneke neteweyî ya hemû gelê Kurd e.

### Ev siyasete xizmetê ji gelê kurd re nake

Karayilan da zanin ku PDK berpirsê sê hevalên wa yên winda ne. Herwiha diyarkir ku kiryarên PDK’ê li dijî berjewendiyên kurdane û gotinên xwe wiha bi lêv kirin: Me hêvî dikir, ku alîkar nebin jî bila bêalî bin. Lê me dît dorpêçin, rêgirtin, îstîxbarat dan dijmin. Niha şerek di navbera Kurdan de peyda bibe û ji her du aliyan bi sedan kes jiyana xwe ji dest bidin wê PDK çi qezenç bike? Eger ev şer wisa fireh bibe, dakeve deşt û bajaran, jiyana xelkî hemû bixe bin bandora xwe, wê çi qezenç çêbibe ji bo siyaseta Kurd re? Lazim e her kes bizanibe. Bi zorê rê qut bike, dorpêç bike, PKK tengav nabe. PKK tevgereke îdeolojîk e, afirîneriyê di nava xwe de pêk tîne, rê û rêbazên xwe peyda dike. Bi van rê û rêbazan ev 40 sal in dewleta Tirkiyeyê şer dike, lê nikare bi PKK’ê. Dorpêçkirin, qutkirina rê ne kiryarên rast û di cih de ne. Em hêvî dikin ku dest ji vê berdin. Ev siyaset xizmetê ji gelê Kurd re nake, xizmeta dijmin dike. Em naxwazin dijminê me kêfxweş bibe.”

### Hinek tişt hene em naxwazin li ser PDK’ê bibe mal!

Ev hêza çû Metînayê, bûye sedema wê yekê ku her roj fikarên pevçunên mezin biqewime hene. Ji ber ku rê birine, heta 300 metreyî nêzî hevalan bûn e. Mesela li wir heywanê hevalan hene, dest danîne ser. Hevalan xwestin van dimena belav bikin, me sekinand. Hinek tişt hene em naxwazin li ser PDK’ê jî bibe mal. Rayedarên wan çiqasî hay jê hene, em pê nizanin. Mesela radibin keran didizin, hespan didizin, dibin ji bo ji xwe re bifiroşin. Ew dixwazin bi şer me têk bibe, me tune bike biçe encamê. Em jî dixwazin bi şer li ber xwe bidin, wî bişikînin û biçin encamê. Berxwedana me ne tenê li Zap û Avaşîn e, berxwedana me ji vir heta Îmraliyê ye. Ez dibêjim her tişt li ber çavan e, lazim e di vê demê de her kes li berpirsyariya xwe xwedî derkeve. Em ê xwedî li berpirsyariya xwe derkevin. Em car din dibêjin aman ha. Gelo mirov çiqasî dikare ewqasî hesasiyetê kontrol bike? Ev heqîqeteke. Ji bo wê em dibêjin, banga ku me beriya niha kiriye derbasdare. Ez hêvî dikim aqûbeta hevalên me di demeke nêz de zelal bibe, em niha li benda wê ne.”



## NATO, Şangay, Îran û Cîhan

**Ahmet AKTAŞ**

Mirov dikare vê sernivîsê wiha jî dirêj bike; NATO, Şangay (VARŞOVA nuh), Îran, Cîhan û Kurdistan.
Di sala1991ê de, bi hilweşandina Yekîtiya Sovyetê re, Peymana VARŞOVA jî belav bû. NATO, di pêşengtiya DYA de weke peymaneke cîhanî bi tenê ma.
Belê Rusya, qîma xwe bi vê neanî. Jibo rêveberiya cihanê, ji DYA re nehêle, ket nava hewldanan û di encamê de, li gel Çinê, di sala 1996’an de Rêxistina Hevkariyê ŞENGAY ava kirin. Di despêkê de, ji ber ku bi 5 dewletan avakirin, navê wê jî ŞANGAY’a PÊNCAN bû. Lê 2001ê de bûn 6 dewlet, 2017 de, bi beşdariya Hindistan û Pakistanê re, hijmara wan bû 8 û êdî navê vê peyamanê yê fermî jî bû Rêxistina Hevkariyê ŞANGAY.
Van peymanên bahsa wan hatî kirin, berhemên cenga cîhanê ya 2’an bûn. Niha di pêvajoya cenga cîhanê ya 3’yan de, gav bi gav zelaltir dibe ku êdî cîhan dîsa ber bi dubendî-sêbendiyên cîhanî ve diçe.
Ji ber ku hinek dewletên xwe bêalî dibînin an ditîne, êdî nema dikarin hebûna xwe bi tene biparêzin. Yek ji va Îran e. Di 12.8.2021ê de Sekreterê Giştî yê Konseya Bilind a Ewlekariya Netewiya Îranê Elî Şemhanî, li gel hevtayê xwe yê Rusyayê Nikolay Patruşev axivî û got;“êdî jibo endamtiya me ya ŞANGAY’ê, li ber me ti asteng nemane!”
Elî Şemhanî, li Îranê xwedî giraniyek berbiçav e. Herwiha vê giraniya xwe li derve jî dide xebitandin. Bi taybetî li Rojhilata Navîn; li Iraqê, Suriyeyê, Yemenê û hwd. yekser li dijî siyaseta DYA û İsrail’ê, di nava hewldanên dijwar de ye.
Bêguman hewldana wî ya ji bo Kurdistaniyan girîngin, hewldanên wî yên yekser têkildarî doza Kurdistanê ne. Weke gelek hempayê wî, heta nuha tiştekî erênî ji bo doza Kurdan ji wî jî nehatiye bihîstin. Lê ev nayê wateya ku ne têkildarî vê mijarê ye. Nexêr, wek mînak di 2015’an de, di 21.12018’an de li Tehranê N.Berzanî (Serokwezir bû), K.Telebanî û F.Huseyin pêşawazî kiriye, hûr û kûr axivîne. Di merasima serokatiya Îbrahim Reîsî’de, pêşewaziyek balkêş a ji derveyî siyaseta Îranê ya heyî pêk hat.
Hema piştî vê gera dawî ya Tehranê, ew daxuyaniya ji bo beşdariya ŞANGAY’ê hat ragihandin. Li vir, mijara siyaset û dizayna nû a vê sedsala cenga 3’yan a cîhanê derdikeve rojevê.
Dewletên sereke DYA û Rusya, dîsa weke berê dixwazin pêşengiya Benda/Pakta bikin. Lê vê carê Çin ne ji wan kêmtir e, di pêşbirka serokatiya bendan de.
Li aliyê din dewletên weke Îranê, Hindistanê, Pakistanê, Japonya û hwd. jî dixwazin cihê xwe qayîmtir û ewletir bikin, di vê piskirika bendan de.
Helbet ya girîng ji bo Kurd û Kurdistaniyan, cihê wan, siyaset û hilwesta wan, ew ê li kû derê û çawa be? Weke tê dîtin riya herî rast RIYA SISIYAN e. Ji ber ku heta niha Kurdan û ti gelan jî, ji wan bend/peyman ên hatibûn avakirin ti xêr nedîtine. Ha halê Filistîniyan, Tamîlan û gelek welat û gelên din li ber çavan e!
Lewma riya rast bi tenê, riya ku Rêber APO nîşan daye; RIYA SISYAN e. Ev rê, bi bingehên baweriya bi xwe û bi hêza gelê xwe ye. Bêguman destek û piştgiriya gelan a navneteweyî ya bi hev re nayê redkirin. Lê pêşî divê her alî bibe xwedî îrade, bibe xwedî fikir û ramana azad û li ser hêza xwe rabe ser piya, da ku karibe piştgriyeke baş bide aliyê din û herwiha piştgriya aliyê din jî nikare azadî û ewleyiya temamî bide. Mînaka Rojava ya şênber li ber çavan e!



# `Dewlata tirkî ji qirkirin û talankirinê têr nabe`

Dewleta tirkî ya dagîrker bi tevayiya rêbazên xwe yên qirêj dixwaze gelê Kurd tine bike. Yek ji wan rêbazan tecrîda giran ya li ser Rêber Gelê Kurd Abdullah Ocalan ne. Îbrahîm Mehmûd diyar kir ku, armanc ji tecrîdê qutkirina şkandina vîna gelê Kurd e.

**Darîn SILÊ-Qamişlo**

### `Bi vê felsefeyê emê bi ser kevin`

Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Îbrahîm Mehmûd da zanîn ku siyaseta niha li ser gelê Kurdan tê meşandin, siyaseteke kevne û qirêj e. Îbrahîm axaftina xwe wiha domand: “Bi hezarê sala ye dwlat tirkî siyaseta qirkirin û talankirin gelê Kurd xistiye planên xwe. Komploya ku li ser Rêbertiya me hat kirin, yek ji rêbazê herî qirêj ya dewleta tirkî ye. Armanc jê ew e ku, fikir û felsefeya Rêbertiya me ji me qut bike. Herwiha ev Komplo ne li ser rêber Apo tenê, li ser tevayiya gelê Kurd e. Ji bo wê jî ev komlo pêk anîn da ku vîn û îradeya gel bişkînin û wan ji azadiyê dûr bixin. Lewra dewlat atirkî ya dagîrker baş dizane ku, Rêbertiyê bi ramanên xwe, hêzeke mezin daye gelê Kurd.”
Îbrahîm got, `erê rêber Apo fîzîkî di hundirê zindanê de ye, lê bi rih û felsefeya xwe di dilê gel de dijî.` Îbrahîm Mehmûd wiha dirêjî da gotinên xwe : “Ne gelê Kurd tenê, rojhilata Navî tev li ser fikir û relsefeya Rêbertiya me dijî. Mirov dikare bêje, felsefeya Rêbertiyê li tevayiya cîhan belav bûye. Lewra ramanên rêber Apo dîmokrate û armanca wî azadiya gelê bindeste. Li ser vê felsefeyê em mezin bûne û heta yek ji me hebe emê piştgiriya vê felsefeyê bikin û ji bo rizgarkirina Rêbertiyê emê têkoşînê xurttir bikin.”

### `15ê Tebaxê ji kurdan re gaveke dîrokî ye`

Mehmûd pêngava 15`ê Tebaxê jî bîr anî û got, `niha em di heyva Tebaxê de ne ev heyv jî ji bo kurdan pir pîroz û girîng e. Lewra di 15`ê Tebaxê de çirûska berxwedanê bi rêveberiya şehîd



Egîd hat destpêkirin.` Îbrahîm Mehmûd axftina xwe wiha doman: “Bi vê gavê gelê Kurd li her deverê hat naskirin. Niha jî bi rihê berxwedana 15`ê Tebaxê gelê Kurd têkoşînê dikin û li hember dijmin bi lehengî, şer dikin.”
Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Îbrahîm Mehmûd bi van gotina aaftina xwe di dawî kir: “Dewleta tirkî çi dike bi ser nakeve. Niha jî nema zane ka bi çi şêwazî kurdan tine bike ji bo wê jî êrişên xwe li ser çiyayên azad dewam dike. Lê wê ti çarî nikaribe gerîla bişkîne, lewra ew xwediyê mafin. Ne li çiyayên azad tenê li her deverê dewleta tirkî êrişî gelê me dike. Ya herî girîn û pêwîst ew e ku, gelê me bigihêje wê baweriyê ku, ew xwe ne parêzin ti kes wan ne parêz e.”

# ‘Gerîla teknîka artêşa Tirk pûç kiriye’

**Gerîla Çiya Kobanî ku li herêma Zapê li dijî dagirkeriyê têdikoşe, da zanin ku artêşa Tirkiyê bi hemû derfetên xwe êriş dike, lê nikare li hemberî gerîla bi ser bikeve.**

Gerîlayê HPG’ê Çiya Kobanî ji herêma Zapê derbarê êrişa dagirkeriyê ya artêşa Tirk a li Herêmên Parastinê yên Medyayê ji ANF’ê re axivî.
Gerîla Çiya Kobanî da xuyakirin ku artêşa Tirk xwe spartiye teknîkê û got, Ji xwe tê zanîn ev 3 meh in, artêşa Tirk bi derfet û hêza xwe hemûyî êrişî qadên gerîla dike. Li Avaşînê, dijmin gelekî êrişî deverên Girê Sor û Werxelê dike. Li wê derê hemû teknîk û çekên xwe yên kîmyewî êrişê dibe ser hevalan. Heval di nava berxwedaneke mezin de ne. 24 saetan balafirên keşfê li ser van herêman digerin. Bi vî awayî dixwazin derûniya gerîlayan têk bibe. Lê belê berovajî, gerîla di binê ewqas teknîka artêşa Tirk de, çalakiyan li dijî artêşa Tirk pêk tînin û bi sexlemî jî digihîjin cihên xwe. Yanî gerîlayê nû, gerîlayê ku di xwe de guhertin û veguhertinê de ava kiriye, teknîka artêşa Tirk pûç kiriye.




### ‘Ne 3 mehan, 3 sal jî be emê li berxwe bidin’

Gerîla Çiya wiha domand: “Ev nêzî 3 meh in, Avaşîn li ber xwe dide û heya niha jî neketiye. Ji niha û pê ve jî wê nekeve. Niha li piranî Herêmên Parastinê yên Medyayê gerîla li hemberî dagirkeriya artêşa Tirk li ber xwe dide. Li Werxelê û Girê Sor artêşa Tirk bi fikra ku wê hevalên me têk bibe hemû çekên qedexe bi kar tîne. Lê bila her kes baş zanibe û jê bawer bike ku tu caran Avaşîn nakeve. Ne 3 meh 3 salan jî wê heval li ber xwe bidin. Em weke gerîla bi moral û coşa xwe, bi îradeya xwe girêdayî vê dozê ne. Lewma dewleta Tirk tu caran wê nikaribe gerîla li bin bixe. Eger ji çekên kîmyewî wêdetir tiştek dinê di destê artêşa dewleta Tirk de hebûya wê ew jî li hemberî me bi kar bianiya.”

### Derûniya leşkerên Tirkiyê têk çûye.

Gerîlayê HPG’ê Çiya bi bîr xist ku ev 38 sal in gerîla li dijî artêşa Tirk li ber xwe dide û got, “Em heya niha tune nebûn, ji vir û pê ve jî em ê tune nebin. Bila her kes vê yekê baş bizane. Her ku teknîkek nû bi destê dewleta Tirk dikeve dibêjin, ‘em ê bi vê teknîkê gerîlayan tune bikin’. Eger were bîra xelkê, dewleta Tirk sala 2016-17’an balafirên bi çek ên bê mirov bi dest xistin û got in em ê bi vê gerîla tune bikin. Lê belê wer diyare artêşa Tirk jî ji gotinên xwe bi xwe bawer nake. Xwe bi xwe dixapînin. Vaye em tune nebûne. Her ku dem diçe gerîla ewqas bi moral dibe, ewqas pêş ve diçe û ew qas jî mezin dibe. Ewqas roj in artêşa Tirk dixwazin têkevin tunelên şer. Bihostekê ber bi tunelan ve gav diavêjin, lê dema hevalên me çalakiyên bi bandor li ser wan li dar dixin, 2 bihostan şûnve gav diavêjin. Ev jî ji tirsê tê. Derûniya leşkerên têk çûye. Mînak şev leşker nerehet in. Ji ber ku hevalên me veşartî ne û di nava taritiyê de hevalên me ji nişka ve di nava wana de derdikevin û li wan dixin. Lewma jî leşkerên Tirk gelek tirsiyane. Ji bo pêşî li vê bigirin jî artêşa tirk hemû teknîka xwe şevê seferber dike. Lê disa jî li hember hêza gerila bê çare ye.”
*ANF*

## Bêçarebûna Sûriyê ya Be´esê

**Zekî BEDRAN**

Rejima Be´esê li Sûriyê hilbijartin kir. Beşar Esed ragihand ku ji sedî ser 95î re ji gel deng girtine. Di ser hilbijartinê re meh derbas bûn, lê li Sûriyê ti guherîn yan jî nîşanên guherînê nehatin dîtin. Di rejimên demokratîk de ne pêkan e ku endamek nêzîkî sedî dengan bistîne. Lewra ti civakên yekpare nînin û berjewendiyên her kesî ne weke hev in. Bi taybetî li ciyekî weke Sûriyê ku xizanên wê pir in û rêveberî ji komek dewlemendên li dorê kom bûyîn pêk hatiye, ne pêkan e ku berjewendiyên gel weke hev bin. Eger wisa bûya Esed bi ser ket, baş e ne pêwîst bû ku Sûriye niha rihet bibe û azadtir be? Lê tişteke wisa nîne.

Di rejima Be´esê de di watê hişmendî û rêveberiyê de ti guherîn çênebûn. Gelê Sûriyê nikare rejimê rexne bike. Rewşenbîr û yên cuda dihizirin nikarin biaxivin û xwe bi rêxistin bikin. Yên bi rejimê ve ne girêdayî yan rexne dikin, yan mohra xayîntiyê li wan têxistin û tên tinekirin yan, neçar dibin birevin. Pêdiviyên gel yên herî sereke pêk nayên. Dolar her ku diçe bilindtir dibe. Mûçeyên kesên dixebitin têra xwedîkirinê nakin. Rejim dibêje sedema tinebûn û xizaniyê ambargoya li ser Sûriyê ye. Bêguman bandora ambargoyê heye. Lê ma para rejimê di ambargoyê de nîne? Bajarên Sûriyê bi giranî roxiyane. Ma ev şerê navxweyê tev berhema hêzên derve ye? Eger ji sedî ser 95’an re gel dengê xwe dide Be´esê, wê demê ev serhildan û reva derve ji bo çi ye?

Beşeke girîng ya Sûriyê ji aliyê dewleta tirkî ve hatiye dagîrkirin. Beşek jê di destê Rêveberiyên Xweser yên DAIŞ şkandîn de ye. Rêveberiyên Xweser her tim bangî rejimê dike ku pirsgirêkan bi diyalogê çareser bikin. Lê rejim guhê xwe nade wan. Halbukî diviya rejim vê ji bo yekbûna welat bike firset. Eger rejim û bakur-rojhilatê Sûriyê li hev bikin, wê hêviyê bide seranserê Sûriyê û pêşiya demokrasiyê vebe. Û wê dewleta tirkî tevayiya awantajên xwe winda bike. Eger Sûriye bibe yek wê derxistina Tirkan hêsan bibe û di destê wan de ti eger namînin.

Rûsya jî naxwaze li Sûriyê çareserî çêbe û demokrasî were. Amerîka û hêzên koalisyonê jî derdê wan ne demokrasî û aştiya navxweyî ye. Ew dibêjin, em dixebitin ku DAIŞ careke din xurt nebe. Ji bo Rûsya jî rejim girîng e. Derdê wan ew e ku li Sûriyê bimînin û berjewendiyên xwe biparêzin. Perîşanî û xizaniya gelê Sûriyê ji wan re ne derd e. Derdê dewleta tirkî jî ew e ku Kurdan biperçiqîne, bi çeteyên li dora xwe kom kirîn bi navê artêşa Sûriyê ya milî bi kar bîne û bike bedîla rejimê. Erdoganê faşîst bi milyonan Sûriyeyiyên reviyayîn welatî wî di karê erzan de bi kar tîne. Li ser navê wan bi milyaran Euroyan ji Ewropa distîne û wan dike amûrê şantajê. Ev dewletên me behsa wan kirî diyar e ku hesabê wan li ser Sûriyê heye. Yê vî hesabî xerab bike jî gelê Sûriyê ye. Gelek ku xwe bi rêxistin bike û li dora sîstemeke demokratîk bibe yek, wê li ser piyên xwe bisekine û lîstikan xerab bike. Eger rejim vê hişmendî û polîtîkaya xwe bisepîne wê gelê Sûriyê çawa bibe yek? Çawa ku tê dîtin rejima Be´esê di rejimeke otorîter de biisrar e û dixwaze her tişt weke berî 2011an be.

Welet parçe bûye û beşeke girîng dagîrkirî ye. Gel xizan û perîşan e. Paşroja wan ne diyar e. Hilbijartina bûyî kîjan hêvî afirandin? Tişteke wisa nîne. Wê Sûriye kengê û çawa bigihe aştiya navxweyî û aramiyê? Ti çareserî xuya nakin. Pirsgirêk weke xwe li holê ne. Faturaya wê jî di serî de jin û gelê Sûriyê didin. Yên li dora rejimê dewlemend dibin. Çavkaniyên Sûriyê li hev par ve dikin. Rejima Be´esê li şûna ku gelê xwe himbêz bike reformên demokratîk bike li deverên weke Şehba bi egera ku serê xwe jê re danaynin ambargoyê datîne ser welatiyên Sûriyê. Ji vê hişmendiyê yekîtî û demokrasî dernekeve. Ji bo wê îro pirsgirêka sereke rejima ye yekpartîbûnê û rejima Be´esê ye. Divê gel daxwaziyên xwe yên azadî û demokrasiyê bi dengê bilind diyar bike û têkoşîna xwe xurt bike.